Helbestine Mîjoke

**Helbestvan: Ezîz Xemcivîn**

Derhêner û çapa dîjîtal
**Sîrwan Hecî Berko**

**Ji weşanên Malpera Amûdê**
**Hejmar: 26**

**www.amude.com**
**info@amude.com**

**Hemû mafên çapê parastî ne.**
*© Ezîz Xemcivîn û Malpera Amûdê ( 05/2003 )*



EZÎZ XEMCIVÎN

# HELBESTINE MÎJOKE

Helbest

çend rok li paş wê

berevaniya xwe dikin…!!

Çavê min

di aşê tavikê de

awirên dûr,

nerînên durist,

dike ko bihêre …!!

dilek erê,

dilek na,

destar geriya,

hoy felekê … destar geriya !!

erê…erê … na … na …!!

Dest hat

û agir da bin hêtûnê;

dest hat

ax û xwelî veda….

û ew çiyayên şermezar

li ber qêrîna min,

heger digrîn,

heger dikenin,

qebqeba wan dîroka min dida…!!

Di kat û keysê de

Konê berfê

ji zimanê min barkir..!!

çîçikên peyvên qerimok

ji hêlîna rûsar biderçûn,



## Hey... li bende me !!

Hey ez li bende me!

kêlîkên şevê

sawa hev dimalin;

dem ji demê fedî nake…!!

hey ez li bende me..!!

û tirseke xwînmij,

li sînorekî cudabûnê

nîv alekê bilind dike…!!

bo çi?

çima?

ne lem karin bêjin.. !!

ne şax bi mebestên digihêjin.. !!

ez roniyê doz dikim:

hey, ez li bende me.. !!

kaniyê çavê xwe vekir,

li warê min jiyan herikî…

Bilbilê xwenê

ji hêlînê firiya;

hêviya min

li burcê sêzdan ronî veda…!!

li wan qatan

ez gihiştim sînorê perdê,

dozek ne diyar;

## Çîrokên çavan

Çîrokên çavan

Pir xweşin…!!

Gava li hev dicivin,

û ji hev re dibêjin:

evîn bê me nagihê,

evîn bê me nakelê,

û bê birajtin

bihin û dû pê na kevê.. !!

Çîrokên çavan,

salixdana bêriyên her gav

hilî di canan de

têne çandin…!!

Wek buhar û avê

yek nerîn ,

di meye …!!

War û hêlîn

li ser qeymaxê çîrokê

ava dikê …!!

Çîrokên çavan ,

ta bi ta

tevna miradan dihûnin ,

bi hev girê didin …

çi xewn ,



sînga çiyayê min bû ronî

hey çiya

tu dizanî hîn şîrmijim!!

hey ez li bende me !!

hey ez li bende me !!

12/8/1999

## Dereng e..

zû were,

jîna min,

avaniya li ser

hêviyê avayî me!

were pişkojeke nazik

li serê şaxê jiyê veke..!!

were bê giranî ,

li ser kolînê ezê te hildim…

Eyazê min

hetavê li Sereba can

ji xemla xwe bide …!!

mistek ji rewanê min tu dayî ;

ji kezebê bersivê bistîne… !!

were li benda te ,

koç û karwanê

xweziyan rawestiyan …!!

Hinek ji aramê ,

hinek ji bilindiya damê ;

bûne peyv ,

ji sebr û samanê weşiyan …!!

Were

Mesîh û Mûsa hatin ,

çiya xûzbûn ,



çi bîranîn ,

yan peyman û sozbirîn ,

raste rê

zimanê çavên evîndar

peyvên heyvan

bi dilan di de zanîn …!!

Ev buhar û evîn ,

Civanê

çavê gulê û pinpinîkê ;

dem bi xêr be …

bersiva ;

çavê hîvê ji çavê rokê

dil bi dil , li hîvê dinere ..!!

bi çavin zelal bînahî

li pertûka ramanê di çêre …

deşta çavên evîndar

bi şahiya xwe

rojan , li temen na jimêre 21/3/2001

## Evîna min

Niha tu dizanî

ez çi ji te divêm ….. !!

dilekî sipî ,

rastî û ronî

av û êm …!!

Rû bi roj û şev vêketî ,

ne çiya lê bike sî ,

ne ewr bidin ser dêm … !!

ji dil buhar geşbî ,

gotin sîmav û zêrav bidin …

wa divêm ; bi peyivin :

bi ken û henek

çav û dev û dêm …!!

bi şademanî hêlînê vekin ,

rastî li ku hebe

ew e war û herêm…!!

Her wa ,

ez ji te divêm

şemala di rewan de vêketî ..

tu germa dil bî ,

dil li te tê keys û fesal..

kêlîkeke hingivîn

li bal te ;

hêjaye deryake sal …!!
11/4/2001



sîngên me ji bo te

li hev hatin …!!

Bendewariya Mihdiyê zeman

di evînê de bûye tov…

ser çavê min xatirê şahiyê

gulên kesk û sor

di buhara pêjna te de ,

xemilandin… !!

were kedera min ,

Hinetîtka dilê tehtika min..

li zinarê civînê kewo bixwîne ,

çepikên me ji te re

sorgul û sosin

vejandin … !!

3/4/2001

## Dengê te

*Diyarî: seydayê nemir TÎRÊJ*

Dengê te;

dîlok û heyrana xecê

li sîpanê xelatê..!

Berfxurka kohê metîn,

xuşxuşa bengîn

ji pêlên zab û ferat tê!

Dengê te ;

ji ewrên serbest tê ,

dengê te …dengê te …

awirên peyivok

li sawîrên azadiyê …

ji nerîna bîstanê ciwaniyê

dengê te ,

bilûra hêviya şivanî

li welatê bavê Fexrî ,

li welatê Edûlê û Derwêşê Evdî…

dengê te ,

bilûra kalemêrekî

ro li ber ava ye…!!

Tîrêjên biyan

ji hinavê birînê dike der..!!

dengê te ,

mûma rojbûna te bû ,



sosina buhara xewna te bû ..

wa tê .. birûskê vedide..

dengê şîrê şahiya bêrîvanê…;

dengê te ,

awazên şehê dar ,

li porê zerî û xatûnê..

govenda tiliyan

li ser sînga evînê…!!

Li gerdena kehrebanî ,

beybûn û reyhan

bi şayikbûna cam û mermer e..!!

dengê te ,

sirûdên perestinê li laleşê ,

vêxistina Zerdeştê kalbûn .. !!

dengê te dibe

pelên zend-avista

bawerî û roniya Hirmiz ;

dengê te … dengê te ..

her dimîne dengê te …!!

22/7/02

## Dûrî

*{Ez dûrim û tu jî dûrî, hey Ronak dibêjim te were}*

Dengê te li ber guhê min e
xweş e, zîz...û zelal e..!!
Rengê te li ber çavê min e,
Mîna şeva sersalê...!!
Hey evîn tal e bi me
şekirê Şamê !!?
Ez dûr û tu dûr î,
me warê xwe berda...!!
Canê min bû êzing ,
dilê te bû agir
bi xwîna min re gerya..
rewanê te ,
di ûjdanê min de meya...!!
pêlên evîna te
ez li ber çûm...
wek gawiran dûrkirime
ji gemiya nûh..!!
Hey cûdî?..
ez li bextê te me..
li kohê pêsîrên xwe,
ji taloka Yezdanan



## Peyvên me

Gurzek ji peyvên me ,
li panava dilan
belavin … belavin …
findanên vêketî
li ber roniya wan
ji sîtava xwe şerm dikin ,
û di nav re
hin ji rewşenê di dizin;
zêrin …nexşin…
kilîtên buhişta evînê ne …
jiyanin …
li kata bengîn
bi cî dibin ;
li roniyê zîl didin
ahoya dan û standinê ne,
ji siya tûmekî
di kevin ber pala girekî
li weşîna hezkirinê
dibin şopgerîn….!!
18/1/01

min  biparêz...!!

Min divê bi wê gerdenê şa bibim,

bi bêhna sosinên welatê xwe

ez şiyar bibim...!!

Min divê ji gewriya kaniya te,

bi serbestî firek av vexwim..!!

Ez dixwazim,

tu jî weke minî...

nerîna te , li mizgîniya nama minî..

de were...de were...de...were..

va ez jî bi ber te de têm...

kengî emê bigihên hev?

Kengî emê bêriyên xwe

bikin berdêlî?

bi ken û girî

pîvanê bişkînin?..

destê te bigrim,

ne  xewn e ..?

hêviya me pêk bê ,

ne guneh e...?

buhara me şîn bê,

miradê me bi cî bê,

bela pêla dûriyê bi temire...!!

Here û bê oxir

ji nav bera dilên me

bifire ...û bifire...!!



## Rewanê şahiyê

Emê kengî,

wan bîranînan vegerînin …?

Tihna xwe

ji kaniya çavan sar bikin ,

û vemirînin …?

Destê xwe li bihriyan

pelû bikin ,

wê rewrewkê

li ber siya evînê veçirînin…!?

Agirê dilan

Li hinarkên rûyan  ;

Sorgul bi şermê re

reng bide û bi vejînin … ?

peyvên xalxalok

ji ser ziman ,

binefş û nesrîn…

perwanekê

ji tengiya hilma xwe bifirînin …!!

Destê xwe bi hevdin ;

bi xemla bûk û zave

“şerbik “

li ber pê te bi şikînim …!!

Bi xwedêkî were ,

## Şenso

Ev çi çepgerîne ;

dîsan tu xwe dide alî…?

Berê te dev ji min berda bû,

heya kengî tê xeyidî bimîne… ?

ma wisa ye ezbenî ..?

perîşaniya min ne bese ,

tu jî derdê giran di dî ser

gul li buharê

terez wê diçine !!

dixwazim tu mêrbî ;

carekê tenê

beramber tavên zemên

bibî dîwar … !!

di pala xwe de ,

min hilînî.. !!

te gelek ji hêza min bir ,

lê te şîret dikim ;

bi ber pênûsê de neyê… !!

tê di doja girrê peyvan de

bi şewitî … !!?

were hênkaya sibê ,

nîvişkê xwe deyne

li ser pariyê min ,



em rewanê şahiya xwe

bi hev re

bi jenînin …!!

………….
………….
…………..
………….
………….
………….
………….
………….
………….

## Mizgînê

*diyarî: hemû kulîlkên ko di ciwaniya geşbûnê de diçilmisin*

Mizgînê ,..!!

Gula bi bîn

şêrînê,

por sorê ,

rû geş û çav şînê…

Mizgînê ..!!

ma 11 sal besbûn ,

tu dilê me bi sotînê ..?

ew jîr bûn ,

ew zanyarî ,

divê mirin

lêbûrînê ji te bixwaze … !!?

hîn gelek pirs mabûn ,

te bersiv bi xwe re birin .. ?

ew qurmiçandin

temen bi xwe giriya …!!

hêviya dê û bav bû ..

û kalo her li benda te ye !!

êdî ji dibistanê vegere

serkeftinê bi xwe re bîne …!!?

Çawa gula geş

ji geşbûnê çilmisî ..??



dîsa em dost û birane… !!

heyvanê te paqije

û şîrê min {helale}

ez bawerim

wê mastê peyama me

bi qeymaxbe …!!?

2/10/2001

## Hey buhar im

Hey buhar im ,

bi te hatim …

bi te hatim …

wa bilbil im, te geş bikim;

wa qazim mizgînê bi te bidim

hey buhar im,

ez çî me?

deşt û mêrg im

lema bîstanê hêviyê me?

li serê şaxê pişkoj im;

rengekî xweş im,

bihna şevnemê

min ji kenê te vedida..!!

dilê min, bi te hatim…

bi te hatim…

ronî bûm

di roniya te de winda dibûm..

biweşîne bayê viyanê

ji te hatim, bi te hatim

hey buhar im;

dilê min,

li mêrga evînê distira..

dengê azadî,



şagirt vegeriyan

ji bilî te Mizgînê…!!?

Gelo çi bû ?

çû û ne hat ;

çav li bende

matmayî û xemgînin … !!

ji nişkave

agir da cegerê ,

hêtûna dil vêket… !!

padîşahê sitemkar

gul bir… gul bir ;

gava roj çû ava …

bilûrê ; bi nalîn û fîxan got :

barkir … barkir …

Mizgînê ji nav me barrrrrkir … !!?

**Bavê Şiyar**

Amûdê 26/9/2002 {ev helbesta Bavê Şiyar e , min amade kiriye}
dilê min li gel we her dinale…………….

Ezîz xecê

hey tilûr im ,

evîndar im ,

rengê te bi min

herdem jîn e …

21/12/2001



qebqeba çiya,

serbilind li kohê Metîn

li Agirî,

li Zagros ,

û li Kurdaxê

wa distira…!!

Hogirî

berqef û şikeftên xwedî nas

koz û çalên mêraniyê…,

evîna çiya

û berfa zinaran dibûm …

ji te hatim,

bi te hatim,

roka azadiyê,

bayê bînvedanê

û dengê destar û hêranê

li ber kevirên Laleş

perestê hebûna te ,

ez sernixûz dibûm!!

wer ez hatim ,

wer ez dimînim…!!

Bi dilê te dîl im

girtiyê sîwana hezkirinê me…

hey buha rim ;

geşbî li me

baran e, berf e…

## Evîna te

Evîna te gulav e

bîn belakir…

sîwana dil veda ,

sawîrê buharê li nêv xuya kir…!!

Gulave , her kes bîn dike…

rewşene,

şevtarî ronî dike …

pût û latan ,

bi rewan û hest dike ..

evîna te jîn e

bê sînore …

heger kanî be ,

wek ferête diherike …

li bal bijîşkên evînê

em kedî bûn …

derman çi bû

hevdîtina me , hembêz kirin

şev pêde

li ber mûma zayînê

di çavên hev de , bikevin  derya ,

gemî û kelek li ber pêlan

li ser pişta avan ,

em bibin deryavan …

herin dûr ,



bela kes me ne bîne !!!

ma kî dikare

hestên gulgulî

ji şahiya me hilîne ?/

hela were , ax …

çiqas tu dûrî !!??

bawer neke

ko bîranînên te

di dilê min de  …demsalin ,

bi demê re diçin …!!

bawer neke

ko hembêza min

ji tihna te sar bibe … !!

evîna te diruşmê ,

bi dilê min key da ..

nîşana jîne ,

di birînê de

pişkojeke teze der da ….

Ew qas rê û qûm û çiya

Li ser te kom bûn ,

Evîna te

di bin giya de ne ma  .. !!

lewra li dûriyê

evîna te

bû makdera çemên jiyê min…!!
1/1/2002

“ feryad û sed ax û eman “

bêje:

“heyfa evî emrê ciwan “

bêje…!!

Mêvanê te şêrîn e ;

mêvanê te zava ye …

govenda wî xweş bigerînî… !!

heger tu karibî ;

dengê xwe bigihînî « Lava »

ez dizanim ,

wê gelekî

li hêviya bavê xwe bimîne…!!?

Hey Qamişloka wêran

geh tu xemgînî ,

geh tu xemgînî ,

û geh tu xemgînî … !!?

ma tu ne westiyayî..??

ew qas

em barê te giran dikin ,

birînê te pir bûne ;
stêra Cîhad jî

tev li wan dimîne … !!

dayê ne tu tenê xemgînî ;

bi hezaran dayikên xemgîn ,

agirê dilê xwe

weke temaşeya Sînema Amûdê



**Şîna lîzevanê bi nav û deng:**
**{Heysem Kiço}**

Dîsan dilê min

nale nalê dike ;

vê êvarê çeleng û çikçikanê

Yana Cîhad

ji nav me bar dike ..!!

li bavê Felek dibe mêvan ,

li ber tembûra wî

goga xwe

bilind û dûr davêje ;

stêran şiyar dike …!!

Ji nişkave

dengê straneke tê ,

“nalînek tê guhê min ,

lê winda û nehane…

agir berda dilê min ,

tev bû pêt û duxane… “

lîzgeh li ber te ye ;

bi lingê polayî

ji mîrata basê ,

wê gogê

bi virvirîne ..!!

bela bavê Felek ne xeyide ;

bêje bilbilê xemgîn bêje :

## Dînbûna me

Ne destê te dighê
cama dilê min !!
ne namak ji welatê evînê
bi dest min dikeve … !!
bi bîr bînim bîranînan,
bi ponijim di gel
kundê kavilan .. !!
dehê salan digeriyam ,
birîn bûne kanî
qevdên çîçek û nêrgizan
li ber diherikîn .. !!
çi sînorê roniyê
ne hate birrîn … !!?
hîv jî , li navbera me
bi çavan re di axivî …
riya awiran dirêje
stêrên dûr wê na birrî … !!
banga hêviyên me
li ser rêka hevrîşmê bi rêket ….
şevekê
te ez û hiş revandin ,
berê me da kavilan ;
berê me da sînorên beyan ,



li gel te bi bîr anîne … !!
gava darbesta zavê te hat ,
bi gulan xemilî bû ;
gula herî xuyanî
bavê Lava , bi xwe bû … !!
dengê stranê
û reşbeleka malik wêran ;
ji Dêrê heya bi Qamişlo ,
xak û zemîn
ji ber hejiyan …!!
Koça dawî bû
deqê lîzevanan
ew mûma bi ronî ,
mixabin ;
zû vemirî… !!?
25/10/02

hûrbîniya meşa me

di wê katê de

xewn nayê girtin ;

xew jî direve …!!

Dilên me

bi zimanê çivîkan

bi hev re dipeyivîn …!!

Ev çi dibistan bû

Em li vê evînê fêr kirin ..?

li ber baranê ,

li ber sermê

gavên me ne ma dihatin pîvan ;

destûr li baweriya me şikestin …!!

Dema em ketin wê cîhanê ;

dînbûna me

em bi perestinê gihandin …!!

dînbûna me

çavîkên tirsê û newêrekiyê

tev de vemirandin …!!

Dînbûna me ,

ala evîna hêtûn

li jor û jor bilind kir …!!

Dînê ;

çiqas tu dûr bikevî

ji dûrbîna baz

dernakevî ,



xezala beza bî

ez pilingê xewnedarim ;

heger kevok bî ,

yan gotin û hevok bî

ji tora Xemcivîn

û helbestê ;

tê bi ku de birevî …!!

25/2/2002

ne di nav

peşk û dilopên baranê de

ne di nav leylanê de ,

û ne di bahoza bendewariyê de

li hemû dever û aliyan

te na bînim …te na bînim …

xewnê … xewnê …

dilê min ji lêgerînê

na weste…

şevîngerim;

şivan û pêwanim

li ber hêrana derdan qeraşim … !!

sibehîn , êvar û berbangê

hewar û fîxanê di dêrim …

qebqeba kewê nêrim ,

her gav li zinarê evînê

sirûdan di xwînim ..

bi hêvî me ;

bi vê qîrînê te bi gehînim …. !!!

heger tu xewn bî ,

ezê bêjim ,

heger tu leylan bî ,

ezê bêjim ,

tu strana minî ;

ma çawa ezê te ne bêjim ?



## Çakbînî

Hoy……hoy ….!!

çav ji min di pirsin ;

şiyar û vekirî

bi stêrkan re di çirisin ..

denge deng

li newalan bela bû ,

bi çiyê ve di hilperikî …!!

Bi bayî re hevrê me

te na bînim ….te na bînim ..

bi qulingê zozên re

hêviyan di xwînim ;

tu dibêjî :

berovajî buhar tê

adar û tebax bûne

du baskên xewnekê !!

geriyam li te , ez geriyam …

bêrîvanî hatin û hatin ..

meş rewan

qaz û qumrî û qitik

hatinnnnnnnnnnnnnnnn…

ewr , mij û moran

bînahiya min girtin ..!!

çav li ber xilmaşbûnê ne ;

bi peyvin … bi pirsin …..

## Roniya hêviyê

*diyarî: helbestvan SALIHÊ HEYDO*

*{Ez hatime ji bo gotinekê bêjim ,
û ezê bêjim …lê heger mirinê berî
ez bêjim ,ji ser vegerandim … wê
“sibe”wê ewê bêje , çimkî “sibe”
razekî veşartî di pirtûka bê dawî de
na hêle..!! } c . x . cibran*

bi hêsrên vê nivîsokê

ez kela dilê te hembêz dikim ,

ji roniya hêviya te

ez vê helbestê di rêsim..

dengê te li warê evînê ,

çi rewşenê dide

bibilê xemgîn ,

buhara şîn dike buhişt;

der tên ji hêlînan

kew û qumrî û şahîn

li newalan ,li kaş û zinaran,

li kulîlkên hilma te

silav dike…

ji dîwanên HEYDO ,

ji kaniya helbestan

bi peyvên heyvanok

xwe di rapêçe…!!



kaniya evîna me di herike

li bin siya biyok û çinaran ,

li ber

bihna nêrgiz û sosinan ;

çirûskek

li ser avê

beramber min geş dibe ,

yekcar

ji çavan min bawer ne dikir .!!

lê !!

çi bikim ?

dilê min di kele ,

dilê min înan û baweriyê

bi cî dike …. !!?

ava sar û hênik di bişire ….!!

Kenekî biçûk

ji lêvan der tê ,

wêneyê te

di roniya heyvê de ,

şanî min dike.. ;

û di bêje :

fermo

hey çakbîn

6/11/2002

Xwe di-avêje

Çavên berberojkan…

Bilbilê teye

û destedar li ser nînin..

di wêneyê ciwan de,

dibe mîr !!

li ber bilûra {Memê şivan}

xwedî bû ;

û karwanê derdan

ji salên sêwî bir û cuda kir..!!

Mamoste,

Ji evînê da buharê,

Ji xweşiyê ew da xweşiyê.

Daxwaz çi bû ?

dengê azadî bela bi be..

gotinên têkoşer bi nîvisînin ;

hêza çiya û baweriya pêşmergan…

dîsa dasîtanên ;

{Kêferat û birîna kûr û evîna welat}

ala ciwan êdî

li ser kişwera te hildin..!!

li xaka toreya Kurdî,

te şitlên şêrîn çandin..

bi bejna wan em dildar bûn ,

şa bû gel bi wê rêka ;

“TÎRÊJ Û CEGERXWÎN”



pêşve diçin li ber neynika “XANÎ”

da bi guhêzin hîvê ji cîhana Memo,

bi serbestî li asîmanê

evîndara bê mirad , sîwanan vedin ..

li kenê bendewar

ji lêvên Zînê,

bi bişirin nêrgiz û nesrîn!!

her roj , her meh ,

salmidêr sira bayê

helbestên HEYDO tê..

li firîna perwanan ,

li rewşena penceran ,

bi hêvî tê, bi hêvî tê…

bişkivîna xuncan di de

xama hogir ,

çavên xwe li ser

hezkirina xaka bav û kalan ,

hilma nanê tenûrê,

û li ser geşbûna tifikan vedike…

ji zarotî de ta niha ,

hêrz û hunera helbestan

li ser banê dilê mezin bûye al…

hino hino

textekî zêrîn vedigire,

berbang ; li asoyê tarî peyvan

geşbûnekê di de ,

û nivîsoka xebatker

bê rawestan ,

cotê xwe  li şûvên hevokan

berdewam dike…

31/5/02



## Xwenasname

Bi serê te

sond û qesem  !!

li min bibûrîn

dil sar bûye ,

qeşa û qeşem .. !!

gava di nav me de

dirêj bû ye ;

co û  cobar in …..

kanî dûre ,

bê dawiye ew çem …

kenê li ber diherike ,

di hilgêve

sed razên ne raz ,

bi dest û ling û laş

wek hespê paşûpê

tête ji kaş …!!

Bi sê tîpan

Li asîman

min tu vedayî …

seranser

sîwana evîna min bû ;

ne neynika heyvê ,

tu guhastî

koçk û sera û eywan … !!

## Xaka min

Xaka min ,

ez dibêjim

pilingê avê ket !!

xaka min

ez dibînim :

mijgûlên pincar û endeko

li riwên buharan geş dibin …

dobelan û kavkulîlk

serê xwe didin der …

pencereyên xanim û xatûnan ,

li ser gulistanan di vebin !!

xaka min ,

karwan berê xwe didin te ,

keriyên xezalan

bi serbestî

li mêrgên te diçêrin ….

Seyranên evînê

destpê dikin …

giya , kulîlk û kelbeş

sînoran digînin hev !!

Tajî li dûv kîvroşkan ;

bomban gav dikin …!!

werdek , tivîlk û kew

her çar asîmanên te dibirin !!



heger roka min

pelê te bigire ;

dawî li rewrewka te tê !!

tê tî bimîne

û maka kaniya min

her û her

wê bizê …!!

1/10/1999

## Dilo

Dilo

gelek aza be ,

ji hêlîna baz bilindtir

min evînek ji te re avakir .. !!

Dilo

min got û ez bi te şabûm ,

ji buharê bêtir

min ronî ji te re diyarkir … !!

Bi deqa rokê ;

bazirganiyê bi karwanê

hêviyên te nakim ,

padîşahê derya evînê

ji ser textê zêrîn

tucar ….

te

ranakim ..!!

2/8/1999



xaka min

zimanê gul û sosinan

di rûyê te de dipeyivin…!!

Her tiştî dibêjin ;

vebûna xunc û pişkojan

renge reng

pinpinîkên şermê

serbest dikin ..!!

evîna minî xilmaş

çav vekirin ;

dûrbîna mestiyê ji dest ket …

bê ahîn ,

li salên xela û cela

bi oxira bê veger

girrê strana xwe daweşand … !!

xaka min

li dor mûm û fenerên

zayîna nû

dilê min bû sî û sîwan …

weke yarek

bi xemla bûkaniyê ;

spî û gewherê keçîniyê

di nêv wê taca roniyê de ,

min te dît

min te dît … !!
18/10/1999

## Nameyek ji Seydayê Tîrêj re

*{Berî Seydayê Tîrêj bimre, min ev name jê re rêkiribû, lê mixabin ne gihayê…}.*

Hey Quling
bihna bayê buharê,
sertîpê geşbûnê,
mûma newroz û sersalê,
rûmetê evînê
û guhdanê derdan tiwî….!!
"Qulingê min"
pênûsa ko li asîmanê Kurdistanê
tu firandî, ji te re digot:
"Bi xwedêkî hey Qulingê min ,
bi raweste hela carek,
ji te re bêjim du sê peyvan "
bêje me ey Quling
ew razê ko Tîrêj di guhê te de got ;
bêje û bigehîne milet…
Tîrêj barê te girankir,
derdê wî bêje ;
bi stranî..,
bi helbestî..,bêje
derdê Tîrêj bêje !
kaniya wî diherike,
dev û zimanê me pê şake…
em tîne …!



## Bîrhatin

Çi bîrhatin in, demjimêr in,
Kat bi kat
Dûzanê dil li hiş diguhêzin…!!
Çi şehsiwar û fêris
Ahoya ramanan
didin rav û nêçîrê…!!
Çi rimbaz û segvan
kulîlka gumanê
ji şerma baweriyê
dipekînin ber pêsîrê…!!
Çi wênevan
Qeymaxê kenê Gulê
bi perîk dide der…
li nêv tabloya çavên Blibil
dicivîne li bîrê… !!
meşwarê du dînên evînê
li tariyê
ken û çîrokên bêdengiya wan
wekî {rêka hevrimêş}
li ber wan kin û kurt e, heger bigihê Çînê…!!

19/11/1999

xurtemêrekî cengevan

mîna Siyamend e

dibeze li pey pezkoviyan

siwarê Dêw e

Gamasiyê xabûr e

Piling ê diçe nêçîra

helbestên xezal

şev û roj li ber me birçiyan danîne

ew baxçe û Gulzar

bi xwîna xwe avdida..

çendî dixwestin

dengê Seyda bigirin ,

birin û anîn

gavkirin û pîvan dawî naskirin

mo rok bi destan nayê veşartin ..

Tîrêj tûj in, pir in û belav in;

Erê dikevin paş ewran
ewr diçin,

ew dimînin!!

Ey Quling

hey piximber û şandeyarê Tîrêj

nama ko sipartiye te,

pirtûkeke pîroz e ;

heger tu koçber bibî,

heger tu derbeder bibî,

û bê mal, cî û war bibî



Lê te berî me vexwar ;

ji derya helbestan

te jîna tekoşînê anî ziman…

Tîrêj tu firandî, tu gihandî

û digote te:

bostek ji xaka Kurdistanê,

nadim bi milkê cîhanê…!!

Binêre li dûr, li sîpan û cûdî

bi roniya kofiya Tîrêj girêdayî ne …

ew tiliyên mûmdayî

peyvên azadî ji wan herikîne..

ji pênûsa Seyda pir kevok firîne..!!

Ey quling;

mizgînê belavke..belavke..

seranserê welat

bi roniya dîwanan,

bi helbestên evînî

ji zayîna roka bi tîrêjan geş

ji hilma gul û nêrgizan ,

ji awirên baz û hidhidê Suleyma

bi evîna Mem û Zînê..

kalekî rênas û rêzan

herdem bi hêvî

hêvî bi ronî

ronî bi jîn e…

bejin bi şal û şapik e

## Babirek

Bîranîn bi te re

kêşan û berdana bihnê ne…

hilmek tiwî , hilmek evîn e….

salmidêr te pişikên jîna min

dorpêç kirine..

di şevekê de te digot:

“bi xemên dîl, em yek rewan in ;

perwan e û gul in,

ez bi te me, tu bi minî

ez ewr im,

li ser basikên bayê te difirim "

-dilbera min :

peyvên te herdem

zengilê bîra min in;

li çi welatî bim,

li ser çi axê bijîm

bi rokê re tu diçî ava,

bi hîvê re

şeva min bi te ronî dibe..
hîn jî şahiya min ,

di derya kenê te de

avjeniyê dike..!!

ey stemkar;

nizanim ezê çi



bigihîne milet, bigihîne milet.. !!

Tîrêj dibêje :

Bindestiyê nekin,

birakujiyê nekin,

û wek Dîkan hev nexin

bi serbilindî bijîn

ev banga han

ji sînga têkoşerekî belav bû,

ji sînga Agirî, kohê Metîn,

ji meydana çarçira,

ji xwîna Suleyman Adê

mûma newroza başûr..

ji tifinga Bazanî,Qadî û şêx Seîd,

ji rêzaniya Qasimlo diçirise,
bilind dibe û belav dibe…

Ey Quling

em dizanin barê te girane;

lê nama Seyda divê tu bigihînî…

divê ker û lal û kor

pê hest bibin..

bawer bikî hey Quling

dilê ko helbesta Seyda bigihê

ew dil êş û janê nabîne;

na na bawer bikî

êş û janê nabîne…!!

4/3/2002

ji te re bibêjim.?

rewanê te ji min dûr nabe !!

hevgihan bi te re

ji sawîran nayête daweşîn..

ava coya dil ji bal te diherike.

Pêlên hêza evînê

li bal min xuşînê dikin.. !!

çendîn şevbuhêrk

me bi hev re ronî didan..

li ber wê neynikê

wêneyê me dibû du masî

li ber peravên evînê

di avjenî de mest diman.. !!

şev zîz e

ker û lal e..

ji pêjna awirên me pêve

bê kes û kûs

wek Xecê li sîpan

bê xwedî ma..!!.

emê çawa vegerin

ew qas ji motikên bîranînan

em dûrketine ?

her yek ji me

li dûriya xwe dişewite !!

tev ko em dizanin



em rêwiyê riya dûr in;

cîwar sar ma

saaaaaaaaar maaaaaaa !!

ji zûde

min ew hêsir

ji ser dêman ne dane alî..

ji zûde

sawîrên me

li ser ava xêbûr

ne xuyane… !!

buhar tê , buhar diçe…

salek, du, sê, û deh

xaçirêkên bê bext

riwên me kolane;

por sipî dibe

lê her bihn û hêvî
ciwan diman…

ramana yek salî

wek niha bû…

piştî evê dasîtanê,

evê malik wêranê,

û piştî ko mûma temen

bi ser nêvî ket,

ji nûv de

em li helbesta yekemîn hay bûne..!!

ji nûv de

## Hîn jî Reyhan li ber xwe dide

Dilên bi kula hev man, bo çi hev berdan?

mehra asê li ber destê kê hate birrîn,

çima hev berdan?

Gunehên te pir giran in.

çima te ew pelê şewitî rêkir?

Wek du werdekên avî hevcotbûn,

çi pêlê ew cuda kirin.?

Li ser destê xwe min evîna te xwedî kir

li ser benên hevirmêşî

û li ser textê ac

min kildanê xewnên te bi cî û war kir.

Bese te xwe sipart kavilê xeraban

sed oxir be, sed oxir be !

çendîn pirsên sêwî

li cadan birçî bê nan û av in,

bi dijwarî dibûrînin

serme û qeşa

şehkê poran bi ser cobarên hêsran de

dişikênînin.

Peyva rast li ku derê ji zimanê te ketiye?

Bigere

dibe di paşila şeva qedrê de tu wê bibînî.. !!

çendî dilê min bi te re rast bû

rojekê tenê ji te pê ve keseke din ew ne hejand,



em li tizbiya kul û derdan

vegeriyane..!!

lê dixwazim tu bawer bibî

ko dasîtana evê evînê

bi dawî nabe..

her ez helbestekê diçînim ;

ji xweber polikê te

li navûnîşanê wê geş dibe !!?

pê re dil ve dibe ;

birîndar dibe ;

xwîn jê diherike,

dibe çem û çem dibe gol û derya

gava serê xwe hildidim,
dibînim

keleka dilê te

li ber wan henasan,

bi şahî û dîlan e..

û ala babirekê

bi navê Xemcivîn

rêberiyê dike..

dilvîna min

peravê evîna te

di awirên wî de ,

armanc û jiyan e… !!

25/5/2002

## Ronak

Çendî bîranînan

pel bi pel

ez divegerînim,

çirûsk in belavkirîne…

ne ez dikarim bihevdim,

ne tu dikarî

gurzên peymanan gelwaz bikî.!!

Diçe û tê

li dor xwe dizîvire,

gelo ji van çirûskan pê ve

wê çi bibîne.. ?

dilê min hergav

gencîna te bû,

ta roja îro ji pirsên te

ew vala nebû.. !!

taştiya kewên hêviyên te

her li ser nîvişkê

meşka evîna me bû.. !!

heger te ew kir roja do?

mane ji siba min

xelasiya te tucarî

ji bayê buharan

bivênevê û bê çare bû.. ?!!



ez wilo fêr bûm

oxir be oxir be..

berî cilên min peyvên hesinî

ji talda keserê bi ber te de bivirînin. !

çima û ne çima

te hilma min kir şûşê {Ela-edîn}

bi 40 dizî re te jî dilê min dizî…..

Dizekê; min nizanî bû

ko diziya bi rojê karê te ye,

Dizekê; min nizanî bû

ko sitûna asê bi derziyê tu wê hiltînî!?

Dizekê: ezê çi bêjim,

min digot; sed {Ela-edîn} û şûşê xwe

destên me ji hev dernaxin. !!

Mixabin li ber dûmana şûşeya camcamî

tu firyayî, tu firyayî…. !!

16/2/2003

Wa gîska çiyayî

Destê guran

Çendî dirêjî te bibin

Ji min pê ve

kî dê te biparêzî;

mane ew çiya ez bi xwe bûm… !!?

pênûsa min

çivîka pesindar bû

ji dilê Suleymanî

li ser textê Belqîs tu danî…

ma avdonka şevtariyan

ji bîra te çû?

yan tihna tifika

şevên zivistanê

em li dor wê diciviyan

evan salên dûriyê

ew sar kir…?

Tu bawer bikî

hîn Kitika{pisîk} te

li ser kaboka min e.. !!

hîn ew dîwarê

em li ber dibûn yek

wêneyên me ji bîr nekirine..!!

her pêlweşek ji dil

bi hizra xwe pîvanê dike,

bihîstina dengê bêdengiya çavên te



li ber çavên min e.. !!

here tu bi ku de herî;

kî te bibe,

kî te bistîne,

min dilê te biriye

û di dilê xwe de

ew dîlkiriye..!!

pîroz be

li wan dest û por û laşê ciwan;

pîroz be

ew kenê tije ahîn û kul

na weşe û nabe neyşekir,

ma kî ji min pê ve

dikare

li ser lêvan

mûma geş

bike bûk û bixemilîne.. ?

Dîlber

şeva zayîna evîna te

ji ber serê roniyê ez ranebûm,

Şîrmijê

li ser van destan

te çavê xwe vekir

û cîhanek

bişirî û geş bû

gava navê {Ronak}

min li te kir… !!

21/2/2003

## Karwan

Çi dîmen e

li ber çavê min

ey Helepça şehîd…

di dîroka kurdî de

ma tu tenê yî?

yan giringtirîn kuştar tiwî.

ne cîhan û ne mirovatî dikarin

aniya xwe li pêş gulên te yên çilmisî

hildin.!!

Dilên ziwa bê rewan,

bûne peyker

kew di rekehan de

pûç bûn.

Navê Helepça li kê bû

destê xwe li wênekêşan bigire,

û peyva {la hewle we la }

berî her bihnê

bi siyanîd û xerdel re

bi rê ket…

dûmana mirinê



suxte û pertûk

dane ber bagerê..

dêr û kenişt û mizgeft

neman parastgeh!!

Kîmya çî ye?

bawer bikin

hîn dilê şofîniyan hênik ne bûye!!

Kîmya çî ye?

Sibeha hênik û

êvara hêmin

endelîb û şalûl

awazan dixwînin:

"dilo melûlo lo dilo…

dilo bê çare lo dilo"

ne çivîk firiyan,

ne awaz û lîstik liviyan

{heger gotin ji zîv bin, ne gotin ji zêr}

ma ev li Helepça jî tê gotin..?

seydayê min

ba nema, gotin neman

hewara bêdengiyê dîl bû..

gulên sor

pûç û zer bûn.

Ax, av, ba û rok

Hîroşîma…Hîroşîma…

## EZÎZ XEMCIVÎN KÎ YE ?

- Ezîzê Xelîlê Xecê ye.
- Sala 1965an li bajarê Hisiça li Başûrê-Rojavayî Kurdistanê ji dayik bûye
- Xwendin: Dîploma elektrîk a navendî
- Ji sala 1982an de dest bi nivîsandina helbestê kiriye
- Sala 1985an helbesta wî ya yekem di kovara GELAWÊJ (hejmara 7an) de bi navê « Bê azadî nabe » belav bû
- Sala 1990î alfabêyek kurdî bi bi navê « A.Beya kurdî » belav kir
- Berhemên wî :

1. Kenê pêçayî û henasene azad ….{helbest in kurt}
2. Çivîk difirin , Çivîk li ser darê ne…{pexşan}
3. Hetav ne Leylan ……………………..{helbest}
4. Zindana biçûk……………………..{helbest}
5. Helbestine Mîjoke………………………..{helbest}
6. Xemcivin û Anahîta ……..{pirtûkeke stranan}

Hemû berhemên wî neçapkirî ne.
Ta niha “Hetav ne Leyalan” û “Zindana biçûk” û „Helbestine Mîjoke“ di Malpera Amûdê de hatine weşandin.

Bo têkiliyê:

e-mail: xemcivin@amude.com
telefon: 0097 1505432948 (Abu Debi)



Ne ev ma, ne ew ma!!

Pênûs ziwa bûn,

bihna mirinê

li koz û şikeftan

û li hêlînan

bela bû… bela bû…

her kes, her tişt û her peyv

bi dar û leman re çilmisîn…

karwanê pakrewanan

li ser pira sîratê

wek pertûk û alan

pîroz in… pîroz in…

li çi rûpelî geş bûn,

berbang in… berbang in…

wisa bû ew dîmen…

pênûsa min

dîrokê ji bîr neke…!!

16/3/2003